A. BALÎ / 12.06.2009

DI DÎROKÊ DE TEVKUJIYA LI ŞENGALÊ PÊK HATÎ YA DI SERBORIYÊN EVLIYA ÇELEBÎ DE!.. (1655-1656)

-III-

Di derheqê Êzîdiyan de Seyda Cigerxwîn di berhema xwe ya bi navê „Tarîxa Kurdistan“ê de dibêje:“Kurdên Êzîdî“ yan „Êzîdiyên Kurd“ ; hin dibêjin bermayiyên Zardeştiyanin û hin dibêjin hevalbendên Yêzîdê kurê Muaviyê ne! Lê gotina pêşî gelek bêtir nêzîkî rastiyê dibî. Ji ber ku dixwestin şerê wan bikin. Dijminê Kurd dixwestin me ji hev perçe bikin û dizanî bûn, gelek ji Kurdan, yan Kurd gelek dilxwazê zarokên Îmam Elî ne. Ev Kurdên Yezdî-Êzdî-Yezdanî, kirine hevalbendê Yezîdê kurê Muaviyê û bi vî navî xwestine Kurd bi Kurd bidin kuştin. Bi rastî Kurdên Huseynî û Kurdên Yezîdî gelek ji hev kuştine û dilê dijminê xwe li xwe xweş kirine!..“

Seyda Cigerxwîn berdewam dike û dibêje:“Lê her weku ji tarîxê tê xuyakirin, xuyaye, ku ev Kurdên ku li ser ola xwe kevnare Zardeştî mane, di serê çiyan de bi mêranî xwe parastine û bi gernasî zora dijminê xwe birine.“

Di ew baweriya li jor hatî nivîsîn de navê „Êzîdiyan“ bi navê Kurê Muaviyê „Yezîd“ ve ji hev pir dûr in. Di nivîsandina her du bêjeyan de, bes nêzîkahiya tîpan pê de tiştekî nêzîkî hev û du nîn e! Alîgirên Yezît kurê Muaviyê jî, wek alîgirên aliyê din Ereb û Îslam in. Bi hev re hem şerê hev û du kirine û hem jî her du aliyan neyartiya Êzîdiyan kirine.

Di seyhatnameya Evliya Çelebî de jî, ew nêrina li jor hatî nivîsîn dubare dibe û têt gotin ku:“Melek Ahmed Paşa înşallah bi vê serketina xwe heyfa şehîdên deşta Kerbelayê girtîbe!..“

Neyarên Kurdan bi ol û baweriyên Kurdan, Kurd di nav hev de dabeş kirine û gelek tarîqet û mezheb di nav Kurdan de damezrandine! Bi ew rêkxistin û perwerdeyan Kurd kirine bin bandora xwe. Paşê jî yekîtiya di nav Kurdan heyî têkbirine û ewna bera hev û du dayîne heya roja îro.

Di nav netewa (milet) Kurd de, ola Îslamê berê bi destê Ereban, paşê jî bi destê Osmaniyan hatiye belavkirin. Di vê navbeynê de Kurdên nebûyîn Îslam bi hezaran hatine kuştin. Lê Kurdên Îslamtî nepejirandin wek Kurdên Êzîdî û Kurdên Alevî li ser wan pir caran tevkujiyên mezin ji aliyên dewletên Îslam ve pêk hatine.

Komek ji nişteciyên Şîngalê yên wê demê

Lê ya rast ew e, ku di aliyê civakî de hemî ol wek hev in. Pêwîste, ku baweriyek olî, olên din ji xwe re dijmin nebîne. Dema olên yek Xwedêtiyê bawer bikin, ma wateya dijmintiyê çi ye? Li gor her netewî ola xwe pîroz e! Netewek nikare ola xwe bi darê zorê li ser netew û gelên din ferz bike. Ola bi darê zorê nabe olek rasteqîn. Ji bo ku pêbawerî anîna ol, ji dil û can tê... Ola bi darê zorê bête pejirandin, ew dibe wek rêvaberiya dîktatorên xwînrêj!..
Di aliyê din de sedemên qirkirina Êzîdiyan, piraniya xwe li ser xwesteka serxwebûna Êzîdiyan pêk hatine. Lê wê demê jî, wek îro neyar bi pir hêz û qiwet bûne. Xwesteka serxwebûna Êzîdiyan her carê di dilê wan de hîştine!. Ew naye wê wateye, ku têkçûna Êzîdiyan, xwesteka dilê Osmaniyan rast derxîne. Di dîroka cîhanê de, pir caran yên mazlum wenda kirine û şerxwaz û zorkar pir caran serketine! Evliya Çelebî di seyhatnameya xwe de dixwaze Osmaniyan rast bide nîşan dayîn. Tevkujiya li ser Êzîdiyan bûyî jî, ew dixwaze wek serketinek di ciyê xwe de bide nasandin!
Rewşa Êzîdiyan ya li cîhan îro jî ne baş e!. Êzîdî bi darê zorê pir caran ji ciyê bav û kalên xwe hatine dûrxistin. Îro jî ji sedemên aborî û civakî, ew bûyîne penaberên cîhanê! Ji seranserê welatên Sovyeta kevn bigir heya welatên Ewrûpe, Emerîka û Awustralyayê belav bûne.
Bi bîranîna ew tevkujiya dîrokî, mirov îro jî bi wê xemgîn dibe. Ew bûyer qasî 355 salan berê qewimiye. Di dîroka Kurdên Êzîdî de, ew tevkujî ji rojên reş ya herî reş ji wana yek e! Ew berhema bûyer tê de hatî nivîsîn, destnivîsa wê wek 10 berg di pirtûkxaneya Amasya de hatiye parastin. Ez naxwazim zimanê nivîskar yê ji bo Êzîdiyan tuj, hinek nerm bikim. Çawa nivîsiye, ezê ji tîpên kevn, yên bi zimanê Osmanî hatî nivîsin, wê wusa wergerinim Kurdiya îro.

Evliya Çelebî

Evliya Çelebî, ew li ser hespê xwe siyar e,
Berê xwe daye, diçe ber bi Çiyayê Sîncar e!
Wî, ew tevkujiya dilê mirov disotîne dîtiye,
Bi pesinandina Osmanî jahra dilê xwe jî rîtiye!..

Bi çavên xwe dîtinên Evliya Çelebî yên ji bo tevkujiya (jenosît) Çiyayê Sîncarê (Şîngalê) wusa hatine nivîsandin:“Li dorberê Kela Sîncarê Fîrarî Mustafa Paşa wekû derya bi pir leşkerên xwe ve kela xwe diparast. Li wê navçeyê bi navê Çiyayê Sîncarê tê nasîn qasî çilçar-çilpênc hezar Êzîdî û kelbperest, kefere (kesên bê bawer) û gunekarên çiyayî, ku ew çi mehluqat in nayên zanîn, Yezîdiyên Kurd (Yezîdî Ekrad) hene. Ewna ji Fîrarî Paşa qet naditirsîn. Bi xelat û berîlek piçûk karên xwe yên li gel paşa heyî, wana bi hêsanî çêdikirin. Yezîdî di nav jiyanek baş de dijiyan.
Di vê navbeynê de Melek Ahmed Paşa li bajarê Amedê (Şehrî Diyarîbekir) heftê beyraq sekban (leşkerên bi hespan), ku wan her yek ji sed mêrxwasan pêk dihat, wî ewna amade kirin. Ordiya Îslam ya Diyarîbekirê û ya li eyaleta Wanê, bi leşkerên li cem paşa heyî ve hemî bi hevra heyştê û heft hezar bûn.
Teybetmendiya vî mîletî ya herî girîng, ewna di şikeftan de dijiyan. Di dema Siltan Ahmed de û wezîrê wî Nesuh Paşa de, va mîletê melun (lanetlêbûyî) ew navçeya kirî bûn bin bandora xwe. Va rewşa xirab Melek Ahmed Paşa dît. Wî hemî leşkera Îslamê di sehraya jêrîn re derbas kir. Di vê navbeynê de hemî bax û bexçeyên wan hatin zeftkirin. Paşa ewna bê deng hîştin.
Ji leşkera Îslam re hate gotin ku bi sed hezaran benden garis li ber deriyê şikeftan, bi gurkirina meşkên sîrkê agir bi sapan xistin. Bi aletên hêsinî, deriyên nû di şikeftan de hatin vekirin û agirên pêxistinên heyî mezintir kirin. Di hûndirê hemî şikeftan de dengê zarok û dayîkên melunan dihat! Deng û hawara wan tevî hevdu dibû!..
Ji Kela Mêrdînê bi heştiran şeş topên mezin dane anîn. Ewna li ber devên şikeftan danîn. Bi agirberdana topan, ew melûnên di şikeftan de xwe diparastin, ewna bi guleyên topan dihatin qirkirin! Bi makabên hêsinî kevir dihatin kunkirin û di wan kunan re bi şîşeyan kumbarayên dest (bombe) dihatin avêtin. Dema bombe îsabetî ew Êzîdiyên bi por (saçli dagli) yên melun dihat, ew melunina perçe perçe dibûn! Di pir şikeftan de av diherikî û bîrên avê hebûn. Leşkerên Îslam dema bi bombeyan pêşî li avê vedikirin, av diherikî, diçû û dengê yên dixeniqîn dihat û ji wan hinekan jî, xwe davêtin dervayî şikeftan. Sapên garisê li devê şikeftan dema ba dihat, bêtir agir pêdiket. Bi alevên beralev wek agirê Nemrûd, Êzîdiyên di şikeftan de mayîn, ewna wek kebaba bûryanê dibûn û bi bombeyên dest ji wana her yek perçe perçe dibûn. Gulleyên topan seriyê wan dipejiqandin. Bi qiweta topan kaniyên nû di şikeftan de vedibûn û Êzîdiyên di şikeftan de mayîn difetisîn...
Ji gotina dirêj re çi hewce ye! Di roja heftan de yên di hundirê şikeftan de jîndar mayîn bi hawar „El’eman, el’eman! Ey gûzîdeyî al-î Osman“ digotin û xwe davêtin dervayî şikeftan! Bi mezintiya Xwedê! Di nav ewqas agir û topan de leşkerên Îslamê di hundirê şikeftan de şehîd û qazî dibûn. Kahkaha mîsal! Yezîdiyên Çiyayî yên bi por, di şikeftan de mayîn, leşkeran porê wan digirtin, dikişandin dervayî şikeftan û berberan porê wan diqusandin! Gelek Yezîdî dema zar û zeçê wan dîl dihatin girtinî, wana çavên xwe dikirin der! Bi hezaran wan bi xençerên xwe, xwe dikuştin! Bi hezaran Yezîdiyan, xwe servayî şûrê xwe dikirin û jiyana xwe ji dest dibirin! Bi hezaran jî Yezîdiyên mayî şûrên xwe dikişandin, li dijî dijberên xwe şer dikirin. Wana dijberên xwe ya dikuştin û ya jî, bi xwe dihatin kuştin!
Dîsa jî wan Yezîdiyan, ewên ku dê û bav bûn, wan zarokên xwe hembêz dikirin û xwe di zinarên mezin de davêtin jêr û pare pare dibûn!.. Dema leşkerên Îslamê rewşa wana dîdît, şûrek davêtin wana, xwîna wan li ser keviran diherikî û diçû. Melek Ahmed Paşa, înşallah bi vê serketina xwe, wî heyfa şehîdên deşta Kerbelayê girtî be!..
Ji gotina dirêj re çi hewce ye! Deh şev û deh rojan şerekî mezin qewimî, ku şerê Ahmed Paşayê Piçûk yê li Çiyayên Dûrzî kirî bi navê „Şerê Meanoglu“ ne wusa bû. Tevahî neh hezar serî (kelle), sezdeh hezar şeş sed jin û mêrên tevî raperînê bûyî û qîz û lawên cîwan (gilman) dîl (hêsîr) hatin girtin. Pir tiştên giranbuha wek xalxal û gerdanên ji zêr û zîv û ganîmetên mezin hatin dest xistin, ku mirov bi gotin û bi nivîsandinê nikane dawî lê bîne!

Hetf Bapîrên (Pîr) wan dîl hatin girtin. Ji wan papîran yekî di zincîrê de, dema firsend kete destê wî, serleşkerê di xew de, yê bi navê Zipir Bolûkbaşî bi xençerê, wî di heft ciyan de brîn kir!.. Zipir Bolûkbaşî bi wan brînan nemire û ew jî radibe, wî bapîrî dikuje!„
Çend rûpelên Seyhatnameya Evliya Çelebî ji ewqas salan şunda wergerandina wê ya bi zimanê Kurdî, wê ez gelek xemgîn kirim û bêmecal hîştim. Lê bi deh hezaran ewên, ku di bin ew tevkujiyên hov de derbas bûyîn, rihên wan ji bo duwerojê, ji ewqas salan şunda jî ewqas hawar dikin, ku Kurd hêdî yek bin û tevkujiyên wusa hov di ser Kurdan re derbas nebin!..

Çavkanî û hin agahî:

Seyhatnameya *Evliya Çelebî, cilt IV (Hemî qasî 10 cilt in)*

(1)Tarîxa Kurdistan*, Cigerxwîn, cilt I, Stockholm, 1985*

Melek Ahmed Paşa *di navbeynê salên 1588-1662 an de jiyaye. Di salên 1650 î heya 1651 an*
di saraya Osmaniyan de dema Siltan Avci Memed de serok wezîrtî jî kirye. Di dîroka Kurdistanê de, di nav pir şeran de wek tevkujiya Çiyayê Sîncarê cihê xwe girtiye û xwîn rijandiye

Ahmed Paşayê Piçûk *(1635) li Şamê ji aliyê Dewleta Osmanî û bi navê Osmaniyan Mîrêmiran bûye. Bi êrîş û şerên di navbeynê Osmanî û Dûrzî û Canpoladan de bûyî wî cihê xwe girtiye û şerên kirî de pir xwîn rêjandiye. Ew di dîrokê de, bi pi xwîn rêjandina xwe têye nasîn. Tevkujiya li Çiyayê Sîncarê bûyî, Melek Ahmed Paşa şerê li Çiyayên Dûrzî bûyî ji xwe re wek mînak nîşan daye. Ahmed Paşayê Piçûk jî, tevkujiyek mezin li ser Dûrziyan pêk aniye. Ew bûyera xwînrêj bi navê „şerê Lawê Meanî“ bûyî, ji tevkujiya Melek Ahmed Paşa li Çiyayê Sîncarê kirî re bûye wek mînak! Di vî şerî de serê 26 hezar Dûrzî bi şûr hatiye birrîn!.. Serê jimarek ewqas mezin, mirovî Dûrzî jêkirin ma ne tevkujiyek dîrokî ye. Dema Evliya Çelebî jimara Êzîdiyên Çiyayê Şîngalê qasî 45 hezar dibêje, ji çend hezar dîl pê ve, jimara yên hatî kuştin, ji jimara Dûrziyên li Çiyayên Dûrzî hatin kuştin zêdetir dibe. Wê demê di bajarên mezin de ewqas rûniştvan nîn bûn...*

Mîrê Dûrziyan Şêx Fahredînê Meanî *(1572 - 1635) bi Canpoladan ve li dijî Osmaniyan alîkariya hev du kirine. Canpolad jî bi baweriya xwe „Dûrzî“ ne. Dûrzî ji bi eslê xwe Kurd in. Lê ola Dûrziyan jî, ji aliyê Îslaman ve wek ola Êzîdiyan hatiye nasîn. Dûrzî îro jî li navçeya Çiyayên Libnanê dijîn û xwe Kurd dinasin. Meaniyan li Suriyê, Libnanê û Canpoladan jî, li Çiyayê Kurmênc û li Kilisê, Antabê dewletên bi navê xwe avakirine û bi salan rêva birine. Navên li wan hatin dayîn li aliyê Osmaniyan ve wusa hatine bi nav kirin û her du aşîr jî bi eslê Kurd in û ji bingehekê têne. Her kesek li gor baweriya Dûrziyan nikane bibe Dûrzî. Dûzî ji dervayî xwe nazewicin û qîzên xwe jî nadin kesen yad! Ol û baweriya Dûrziyan jî veşartiye. Pir Îslam navê „Dûrziyan“ wek kufir bi kar tînin!..*

Dewleta Kurdên Canpolad *(1605-1607) navenda xwe bajarê Kilis û Helebê bûye. Sînorên xwe ji Kilis û Antabê bigir heya bajarê Musilê fireh kirine. Ji aliyê Osmaniyan ve hatiye rûxandin.*